NORTON ROSE FULBRIGHT

# AGAHDAIYA JI BO HEMÛ KESÊN DI BINÇAVKIRINA KOÇBERIYÊ YA AUSTRALIYA DE DI 31'Ê ÇILEYA 2014 DE

## Ev agahdariyeke girîng e ku dikare bandorê li mafên we bike.

**Ev agahdarî bi zimanên li jêrê heye: www.immigrationdatabreach.com.au**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Erebî | Azerbaycanî (Bakûr) | Bengalî | Burmayî | Kantonî | Darî | Hazaragî |
| Hindî | Îndonesî | Kurdî (Kurmancî) | Kurdî (Soranî) | Menderîn | Paşto | Farsî |
| Pencabî | Sinhalesî | Sylhetî | Tamil | Ûrdûyî | Uzbekî | Vîetnamî |

## 1 Ev agahdarî der barê çi de ye?

*Paşperdeya Binpêkirina Daneyan*

1.1 Ev agahdarî *(notice)* têkildarî binpêkirina daneyên ku bi riya malpera Department of Immigration and Border Protection bûye ku niha bi navê Department of Home Affairs (**Wezaret**) tê nasîn.

1.2 Di 10ê Sibata 2014 de li ser malpera înternêtê tabloyek ya ku agahiyên kesane yên nêzî 9 hezar kesan tê de bûn, belavokek hat weşandin. Ew kes li cihên koçberîbûnê de an jî di cihên din ên binçavkirinê de bûn. Ew tablo gerek di malperê de nehatiba weşandin. Ew qezayek bû. Weşana bi şaşî ya agahîyên kesane yên wekî nav û navnîşana we, bi "Binpêkirina Daneyan" (*Data Breach*) tê binavkirin.

1.3 Zanyariyên kesane di 19ê Sibata 2014 de ji malpera Wezaretê û di 27ê Sibata 2014 de jî ji versiyoneke dîrokî ya malpera Wezaretê hat rakirin.

*Giliyê ku li Office of the Australian Information Commissioner hate kirin*

1.4 Di 30ê Tebaxa 2015 de li ser navê hemû kesên di bin bandora Binpêkirina Daneyan de ne gilî li Office of the Australian Information Commissioner (**OAIC**) hate kirin. Komîseriya Zanyariyan ya Australya li ser gilînameyê lêkolîn kir.

1.5 Di 24ê Çileyê 2018 de, OAIC ji bo hemû kesên ku ji ber Binpêkirina Daneyan (**Agahdariya Pêşîn**) bandor lê bûne, agahdariyek (wek vê) belav kir. Agahdarîya Pêşîn li ser bandora Binpêkirina Daneyan agahî xwest.

1.6 Di 11ê Çileyê 2021 de Komîseriya Zanyariyan ya Australya biryar da ku:

(1) Di encama Binpêkirina Daneyan de, Wezaret têkildarî kir bi nihênîtiya kesên ku ji hêla Binpêkirina Daneyan ve bandor lê bûne; û

(2) Mirovên ku ji ber Binpêkirina Daneyan bandor lê bûne, heqê wan heye ku ji bo zirarên ku di encama Binpêkirina Daneyan de çêbûye, tezmînatê bistînin.

1.7 Biryara Komîseriya Zanyariyan ya Australya hate itîraz kirin li Administrative Appeals Tribunal (**AAT**). Di 13ê Îlona 2023 de, AAT pêvajoyeke nû destnîşan kir ku kesên ku bandora Binpêkirina Daneyanbi lê bûye dê tezmînatên wan bên binirxînin. Navê vê pêvajoyê Pergala Nirxandina Tezmînatê ye*(Compensation Assessment Scheme)*.


© Norton Rose Fulbright Australia

*Pergala Nirxandina Tezmînatê*

1.8 Li gorî biryara AAT, kampaniya qanûnî ya bi navê Norton Rose Fulbright Australia (**NRFA**) bi rengekî serbixwe ji bo nirxandina tazmînatê ji bo kesên bandora Binpêkirina Daneyan lê bûne, hatiye tayîn kirin.

1.9 Ev agahdarî gava yekem e di Pergala Nirxandina Tezmînatê de.

## 2 Divê ez çi bikim?

2.1 Heger di encama Binpêkirina Daneyan de we tu zirar nedîtibe, hûn dê tazmînatê nebin. Hewce nake hun bersivê bidin vê Agahdarîyê.

2.2 Heger hun bawer dikin ku we di encama Binpêkirina Daneyan de zirar dîtiye, an jî heger hun ne piştrast in, û hun dixwazin di Pergala Nirxandina Tezmînatê de tezmînatê bixwazin, **divê** hun bersiva vê agahdariyê bidin ku di forma bersivê ya onlayin de (***Response Form***) de li ser vê lînkê heye: **www.immigrationdatabreach.com.au**.
Ji kerema xwe ji bo mînakên windabûn an jî zirarê li xala 6 ya li jêr binêrin.

2.3 Heger hun bawer dikin ku we di encama Binpêkirina Daneyan de windabûn yan zirar dîtibe lê nexwazin beşdarî Pergala Nirxandina Tezmînatê bibin, divê hun di bersivdana vê Agahdariyê de ver vekşînin. Forma Bersivê destûr dide ku hun vebijarka *'Opt-out'* hilbijêrin. Ji kerema xwe ji bo agahîyên zêdetir yên der barê encamên veqetandina Pergala Nirxandina Tezmînatê de li xala 3y ya jêr binêrin.

2.4 Agahîyên ku hun di formê de didin dê ji NRFA re werin şandin. Heger hun nikarin xwe bighînin pêwendiyeke pêbawer a înternetê, hun dikarin kopiyek kaxezî ya Forma Bersivê jî dagirin û bersivên xwe bi rêya postê ji bo Compensation Assessment Scheme, Norton Rose Fulbright Australia, Level 6, 60 Martin Place, SYDNEY, NSW 2000 bişînin. Ji kerema xwe kopîyeka kaxizê ya Forma Bersivê bixwazin bi şandina îmêlekê ji bo NRFA li auscas@nortonrosefulbright.com an jî telîfonî (02) 9330 8006 bikin.

2.5 Divê hun ya herî dereng **10ê Hezîrana 2024 de (Dema Dawîyê) heta saet 16.00** bersivekê bidin vê agahdarîyê. Ji bo bersivdayînê hun dikarin dirêjkirina demê bixwazin, lê belê nayê garantîkirin ku ev qebûl bibe.

2.6 Divê hemû daxwaznameyên dirêjkirina demê bi rêya îmêlê ji bo auscas@nortonrosefulbright.com an jî posta qeydkirî ji bo Compensation Assessment Scheme, Norton Rose Fulbright Australia, Level 6, 60 Martin Place, SYDNEY, NSW 2000 bên şandin. Her wiha hun dikarin bi rêya telîfonê li ser 02 9330 8006 bi NRFA re pêwendîyê deynin û dirêjkirina demê bixwazin.

2.7 **Heger we bersiva Agahdariya Pêşîn neda û li gorî Dîroka Dawîyê bersiv neda (û we dirêjkirina demê bi dest nexist), hun dê tazmînata ji ber Binpêkirina Baneyan ji bo ti zerarê nestînin.**

## 3 Wateya vekişandina ji Pergala Nirxandina Tezmînatê çi ye?

3.1 Ji kerema xwe bila haya we jê hebe ku eger hun tazmînata di bin Pergala Nirxandina Tezmînatê de bistînin, hemû mafên we yên qanûnî yên ji bo Binpêkirina Daneyan bi rêyên din (tevî bi destpêkirina dozên dadgehê) tên **girtin.**

3.2 Ev, ji ber ku Pergala Nirxandina Tezmînatê ji bo bi dadmendi îdiaya we ye binirxîne û paşê dawî li her kêşeyên di navbera we û Wezaretê de bîne.


© Norton Rose Fulbright Australia

3.3 Heger hun dixwazin li derveyî Pergala Nirxandina Tezmînatê mafên xwe yên qanûnî bişopînin, divê hun xwe vekşînin bi bersîvdana vê Agahdaiyê û di Forma Bersivê de vebijêrka 'vekşînê' ji Şemaya Nirxandina Tezmînatê hilbijêrin. Berî ku hun biryara vekişînê bidin, em ji we re palpişt dikin ku hun li ser vê biryarê li şêwirmendiya hiqûqî bigerin, tevî lêçûn û zehmetiyên cureyên din yên îdîayan, û eger gelek wext derbas bûye ji dema Binpêkirina Daneyan ji bo îdiayekê ku niha ji derveyî Pergala Nirxandina Tezmînatê bê kirin.

## 4 Lê heger min jixwe zanyarî di bersiva Agahdarîya Pêşîn de pêşkêş kiribin?

4.1 Heger we di bersiva Agahdarîya Pêşîn de zanyarî dane, dema ku NRFA tezmînata ku hun dikarin heq binirxîne, ev zanyarî dê li ber çavan were girtin. Ne hewce ye ku hun heman zanyariyê careke din bidin.

4.2 Heger hun dixwazin li gorî vê Agahdariyê zanyariyên nûkirî an jî yên zêdetir bidin, girîng e ku hun berî Dîroka Dawî pêşkêş bikin.

## 5 Ya ku min bersiva Agahdarîya Pêşîn neda?

5.1 Ji bo we niha fersendeke din heye ku hun zanyariyên girîng bidin NRFA.

5.2 Lê belê, divê hun şîrove bikin ku we çima bersiva Agahdarîya Pêşîn neda. NRFA wê demê dê binirxîne ka mafê we ye ku hun beşdarî Pergala Nirxandina Tezmînatê bibin an na.

5.3 Zanyariyên dibe ku girêdayî we çima bersiva Agahdariya Pêşîn neda, di nav de ev in:

(1) Delîlek ku we Agahdariya Pêşîn nestandîye;

(2) Delîlek ku bersiva we ji hêla OAIC ve bi awayekî rast nehat wergirtin;

(3) Di daxuyaniya nivîskî de hat ragihandin ku nêrîneke we ya şaş heye ku hun dê heqê tazmînatê negirin;

(4) Di daxuyaniya nivîskî de hat ragihandin ku we fêm nekiriye yan jî nizanî bersivê bidin Agahdariya Pêşîn; an

(5) Di daxuyaniya nivîskî de tê gotin ku rewşên din (di nav de nexweşiyên tibbî, zehmetiyên darayî, an jî berpirsiyariyên çavêrî ên ji bo endamên malbatê) rê li ber bersiva Agahdariya Pêşîn girt.

## 6 Ez dê ji ber çi coreyên ziraran tazmînatê werbigirim?

6.1 Pergala Nirxandina Tezmînatê dikare ji bo we tazmînatê bide ji ber:

(1) Xisar an zererên aborî (***Economic Loss***); û

(2) Xisar û zirarê ne aborî (***Non-Economic Loss***).

6.2 Pergala Nirxandina Tezmînatê, bi tenê dikare ji bo Zirarên Aborî û Zirarên Ne Aborî ya ji ber Binpêkirina Daneyan tezmînatê bide. Pergala Nirxandina Tezmînatê nikare tezmînata ji ber xesar û zirarên din yên ne girêdayî Binpêkirina Daneyan bide we.

 © Norton Rose Fulbright Australia

<u>Xisarên Aborî</u>

6.3 Xisarên aborî tê wateya ku xisarên darayî ya ku we kişandiye an jî heqdest kiriye, wekî pereyên ku we (ji lêçûnên bêrîkê) xerc kirine an dahata ku we negirtî ye (zirara dahatiyê) ku ji ber Bipêkirina Daneyan ve çêbûye. Ev yek di nav de:

(1) çi mesrefên bijîşkî yên ji bêrîka we, ji ber Binpêkirina Daneyan we daye. Ev dibe ku mesrefên têkildarî:

(a) Şêwirên bi bijîşkan re;

(b) derman û tedawî ; û

(c) raporên bijîşkî;

(2) Di encama Binpêkirina Daneyan de ji ber ku nekarin bixebitin, windabûna dahatê; û

(3) Ji bilî lêçûnên bêrîkê yên ku we di encama Binpêkirina Daneyan de we dane:

(a) Lêçûnên têkildarî giliyên berê yên ku ji ber OAIC re hatine çêkirin an bersiva Agahdariya Pêşîn ji ber encama Binpêkirina Daneyan; û

(b) Lêçûnên ji bo parastina nasnameya xwe ji ber Binpêkirina Daneyan.

<u>Xisarên Ne Aborî</u>

6.4 Xisarên Ne Aborî tê wateya windakirina ku ne darayî ye (ango zirara aborî nagire). Xisarên ne aborî dikarin wiha bin:

(1) Hestên xemsariyê, strêsê, tirsê, hêrsê, êş û azaran, biçûkxistin an jî şermê;

(2) Nîşanên leşî û derûnî di encama Binpêkirina Daneyan de, wekî windakirina xewê an serêşê; û

(3) Rewşên bijîşkî yên ku çêbûne yan xirabtir bûne ji ber Binpêkirina Daneyan, tevî xemgînî an depresyonê, wekî ku ji hêla bijîşkekî pispor ve hatîye tespît kirin.

## 7 Divê ez çi cureyên zanyariyên bidim NRFA?

7.1 Forma Bersivê dê ji we bixwaze ku hun zanyariyên taybet pêşkêş bikin. Her wiha ji bo piştgirîya daxwaza we ya tazmînatê hun dikarin delîlên din jî peyda bikin.

7.2 NRFA dê delîlên curbicur berçav bike dema ku heqê we ji bo Xisarên Aborî û Xisarên Ne Aborî binirxîne.

7.3 Mînakên cureyên delîlan ên ku hun dikarin radest bikin ev in:

<u>Delîlên ji bo piştgiriya Xisara Aborî</u>

(1) Fatûre û qeydên din ên mesrefên bêrîkê yên ku ji hêla we ve di encama Binpêkirina Daneyan de pêk hatine. Bo nimûne, di nav de, fatûreyên:

(a) hevdîtinên bi bijîşkên pispor re ji ber encama Binpêkirina Daneyan de;

(b) raporên ku ji hêla bijîşkên pispor ve di encama Binpêkirina Daneyan de hatine amadekirin;

 © Norton Rose Fulbright Australia

(c) mesrefên ku we dane (wek ji pisporê qanûnî) têkildarî giliyên berê yên ku ji OAIC re li ser Binpêkirina Daneyan an jî gava ku we bersiva Agahdariya Pêşîn wekî encama Binpêkirina Daneyan da; û

(d) Lêçûnên din ên ji bo parastina nasnameya we ya di encama Binpêkirina Daneyan de.

(2) Paredan, nameyên ji karê we, belgeyên bijîjkî û belgeyên din ên ku delîlên windakirna dahatê ji be ku we nikarî kar bikira ji ber Binpêkirina Daneyan; û

(3) Raghandinên qanûnû, yan daxuyanaiyên îmzekirî ji hêla we, ji endamên malbata we yan jî kesek din ji we ve nêzîk e ku xisarên aborî yên di encama Binpêkirina Daneyan de ku we kişandiye vedibêje.

<u>Delîlên ji bo piştgirîdayîna windahiyên ne aborî</u>

(1) Raghandinên qanûnû, yan daxuyanaiyên îmzekirî ji hêla we, ji endamên malbata we yan jî kesek din ji we ve nêzîk e ku bandorên di encama Binpêkirina Daneyan li we bûne vedibêje, di nav de bandora li ser başbûna leşî û derûnî; û

(2) Rapor, tomar û bawernameyên ji bijîşkên pisposr yê ku diyar dike:

(a) her rewşên bijîjkî yên ku we kişandine yan jî xirabtir bûne ji ber sedema Binpêkirina Daneyan;

(b) her şêwirmendiyên ku we bi bijîşkê xwe yê pispor re we wergirtine ji ber sedema Binpêkirina Daneyan; û/an

(c) tedawîya ku we di encama Binpêkirina Daneyên de wergirtîye.

## 8 Gelo ez dikarim bi telîfonê bersivê bidim vê Agahdarîyê?

8.1 Dema ku bersiva we dê bi awayekî baş were kirin, eger hun bi forma onlayin bersiv bidin **www.immigrationdatabreach.com.au**, hun mafdar in ku bi telîfonê bersivê bidin vê Agahdariyê.

8.2 Ji kerema xwe li ser (02) 9330 8006 de bi NRFA re bikevin têkilîyê.

## 9 Wergêrên şareza

9.1 Ev Agahdarî bi gelek zimanan heye. Ji kerema xwe li lînka di destpêka vê belgeyê de hene binêrin.

9.2 Her wiha mafê we heye ku hun bi zimanê hun bixwazin bersivê bidin vê Agahdariyê. Ji bo daxwaza alîkarîya wergêrekî şareza, ji kerema xwe bi rêya îmêlê auscas@nortonrosefulbright.com an jî telîfonê li (02) 9330 8006 bi NRFA re bikevin têkilîyê.

## 10 Gelo mafê min heye ku ez alîkarîya darayî werbigrim da ku ez bersivê bidim Agahdarîyê?

10.1 Erê. Heqê we heye ku heta 500 dolaran bixwazin ji bo lêçûnên alîkariya ku ji hêla piporekî qanûnî ve we wergiritye dema ku hun bersiva xwe ji Agahdariyê re amade bikin. Ev alîkariya darayî dikare bi forma bersivê bê wergirtin.


© Norton Rose Fulbright Australia

10.2 Her wiha, di dema beşdarbûna we ya di Pergala Nirxandina Tezmînatê de (tevî wergirtina kopiyên wergerandinê yên Forma Agahdarî û Bersivê) hewce nake ku hun heqê xizmetên wegerandinê bidin.

## 11 Pirs û alîkarî

11.1 Heger pêdiviya we bi alîkariyê heye ji bo bersîva vê Agahdariyê bidin yan jî pirsên we hene, ji kerema we têkiliyê bi NRFA deynin li ser (02) 9330 8006 yan auscas@nortonrosefulbright.com.

## 12 Nepenîtiya we

12.1 Nepenîtiya we ji bo NRFA girîng e. NRFA dê zaniyariyên we yên kesane li gorî *Privacy Act 1988* (Cth) berçav bike, di nav de *Prensîpên Nepenîtiyê yên Australia*.

12.2 Li gor fermanên ku ji alîyê Administrative Appeals Tribunal de, NRFA ji alîyê Department of Finance ji bo nirxandina tezmînata ku di bin Pergala Nirxandina Tezmînatê de hatiye tayîn kirin. NRFA dê zaniyariyên we ji bo vê armancê berhev bike, bi kar bîne û eşkere bike. Ji bilî berhevkirina zaniyariyên kesane yên ji we, NRFA dikare zaniyariyên kesane yên der barê we de ji OAIC û Wezaretê jî berhev bike.

12.3 Heger NRFA nikaribe zaniyariyên we yên kesane berhev bike, NRFA dê nikaribe daxwaza we ya tazmînatê binirxîne.

12.4 Dema ku NRFA daxwaza we dinirxîne, NRFA dê hewce bike ku zaniyariyên we yên kesane bi Department of Home Affairs û Department of Finance re parve bike. Ev ji bo ku Wezaret ji daxwaza we fêm bike û bersivê bide. NRFA her wiha dibe hewce bike ku zaniyariyên we yên kesane bi şêwirmendên serbixwe yên wekî pisporên bijîşkî û hiqûqî re parve bike.

12.5 Ji bo em zaniyariyên we yên kesane depo bikin, dibe ku em bi xebatkarên xwe û peymankarên xwe re parve bikin ku ji bo alîkariya me bikin bi teknolojîya em bikartînin ji bo em zaniyariyan we depo bikin birêve bibin. Dibe ku hin ji wan xebatkar û peywendiyan li derveyî Australia bin, wekî Brîtanyayê.

12.6 Siyaseta Nepnîtiyê ya NRFA, zaniyaiyên derbarê ku hun çawa dikarin xwe bigihînin zaniyariyên xwe yên kesane yên me depo kirine û sererastkirina van agahîyan nîşan dike. Di Siyaseta Nepenîtiyê her wiha zaniyariyên derbarê binpêkirina Prensîpên Nepenîtiyê yên Australya û NRFA dê çawa bi gilîyên weha re eleqedar bi henebe. Hun dikarin li ser malpera wan ya înternetê xwe bigihînin Siyaseta Nepenîtiyê ya NRFA https://www.nortonrosefulbright.com/en-au/global-statements/privacy-notice.

12.7 Siyasetên nepenîtiyê yên Department of Home Affairs û Department of Finance bi heman cureyên zanyariyan hene:

- Department of Home Affairs: https://www.homeaffairs.gov.au/access-and-accountability/our-commitments/privacy
- Department of Finance: https://www.finance.gov.au/about-us/privacy-policy-summary

12.8 Eger pirsên we li ser zanyariyên kesane yên ku em kom dikin û em ê çawa zanyariyên we bigirin, tevî her sererastkirina zanyariyên kesane ku we pêşkêş kiriye, ji kerema xwe di auscas@nortonrosefulbright.com de bi Norton Rose Fulbright Australia re têkilî daynin an telîfonî (02) 9330 8006 bikin.

 © Norton Rose Fulbright Australia